# Rapora YASA ya mehane
## Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

## Çileya paşîn 2011




**YA§A e.V.**

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

**YASA e.V.**
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org


## Bavê Selah

## Naverok:

- **Kuştina leşkerekî kurd di artêşa Sûriyê de**
- **Ji bo sê xwendekar û du welatiyê kurd deh sal zindan**
- **Nivîskarê kurd Hewas Mehmûd hate girtin**
- **Helbestvanê kurd Ibrahîm Berekat hate girtin**
- **Dengbêjê kurd ê navdar Bavê Selah hate girtin**
- **Girtina welatiyekî kurd li Kobanî**
- **Pênc kurd li Kobanî hatin girtin**
- **Parêzerê kurd Enwer Mislim hate girtin**

### Kuştina leşkerekî kurd di artêşa Sûriyê de

Di roja Pêncşemê 20.01.2011-ê de malbata leşkerê kurd Elaa Cemal Şêxo (Li gundê Şêx Xorz li navçeya Efrînê ji dayik bûye) termê kurê xwe wergirt. Elaa Şêxo erkê parastina welat di yekîneke leşkerî de li bajarê Laziqiyê pêk tanî. Wî salek borandi bû û temenê wî 20 sal bû. Hate ragihandin, ku wî fîşek li xwe teqandiye, lê hin jêderên nêzîkî malbata wî eşkere kirin, ku tu arîşeyên wî tune bûn, ku xwe bi awayî bikuje! Hêjayî gotinê ye, ku rûdana kuştina leşkerên kurd di dema parastina erkê welat de li leşkeriya Sûriyê bûye rûdaneke ku dubare dibe, nexasim piştî bûyerên gelêrî di sala 2004-ê de li navçeyên kurdan û taxên kurdan li Heleb û Şamê û li herdu zanîngehên wan. Heya aniha hejmara leşkeran di ser 40-î re derbas kiriye.

### Ji bo sê xwendekar û du welatiyê kurd deh sal zindan

Di nîvê meha Çileyê paşîn de Dadgeha Tewankariyan a Leşkerî li Helebê biryarek li gorî doza jimar 571 a sala 2010-ê stand (Endamtiya komeleyeke siyasî û qedexe, ku armnca wê parçekirina

beşekî ji xaka Sûriyê ye û gihandina wî beşê bi komareke biyanî ve). Biryar bi deh sal zindan li van kesan hate birîn:

- Ehmed Welîd Yûsif, gundê Tepe 1981, xwendekarê beşê wêjeya erebî li zanîngeha Helebê, sala çarê.
- Civan Ebdil Rehma El Şawîş, Hesiça, Majistêr li zanîngeha Helebê.
- Ebdo Zihnî Ristem, Ehres 1982, xwendekarê beşê wêjeya erebî li zanîngeha Helebê, sala çarê.
- Cezo Îsa Remo, Pêlwêran 1953, Kobanî, aniha girtî ye.
- Ebdil Rehman Elî Mihemed Elî, Pêlwêran 1988, Kobanî.

**Nivîskarê kurd Hewas Mehmûd hate girtin**

Di roja Çarşemê 12.01.2011-ê vedorgerîneke girêdayî ewlekariya siyasî li bajarê Hesiçeyê nivîskarê kurd Hewas Mehmûd binçav kir. Hewas Mehmûd li ser dergehê sînorê Tirkî û Sûriyê li vegera ji başûrê Kurdistanê hate girtin. Hewas Mehmûd ji bo bidestxistina karekî berê xwe da bû herêma Kurdistanê, da ku alîkariya malbata xwe bike. Hewas Mehmûd endazyar e û di sala 1960-î de ji dayil bûye.

**Helbestvanê kurd Ibrahîm Berekat hate girtin**

Di roja 19.01.2011-ê de Şaxê Ewlekariya Siyasî li bajarê Hesiçayê helbestvan û nivîskarê kurd Ibrahîm Berekat vexwest û ji hingî ve têkilî pê re hatiye birîn û rewaş wî ne diyar e. Helbestvan Ibrahîm Berekat di sala 1965-ê de ji dayik bûye, zewicî û bavê du keçikan e.

**Dengbêjê kurd ê navdar Bavê Selah hate girtin**

Di roja 24.01.2011-ê vedorgerîneke ewlekar hunermend û dengbêjê kurd ê navdar Ebdil Rehman Mihemed Umer (Bavê Selah) binçav kir û ew bir cihekî ne diyar. Bavê Selah 60 salî, zewicî û bavê heft zarokan e. Bavê Selah yek ji navdartirîn dengbêjên kurd li Sûriyê ye.

**Girtina welatiyekî kurd li Kobanî**

Di roja 27.01.2011-ê vedorgerîneke girêdayî Ewlekariya Ezmanî bajarê Kobanî êrîş bir ser mala welatiyê kurd Ednan Mihemed Mistefa ji gundê Kortik Şêxan û ew binçav kir. Tê zanîn, ku yê girtî bi navê Bavê Emmar tê naskirin û di sala 1963-ê de ji dayik bûye.

**Pênc kurd li Kobanî hatin girtin**

Di roja 16.01.2011-ê de vedorgerîneke ji Ewlekariya Siyasî li bajarê Kobanî pênc welatiyê kurd bê sedem binçav kirin. Ew jî ev in: Sidîq Qaso Welê, Henîf Ûsik, Mistefa Mihemed Sidîq, Bekir Necmeddîn Welê û Mihemed Qesab.

**Parêzerê kurd Enwer Mislim hate girtin**

Piştî vexwestina parêzerê kurd Enwer Mislim ji hêla Şaxê Ewlekariya Siyasî li bajarê Helebê bi riya sendîkeya parêzeran di roja Sêşemê 11.01.2011-ê de hate girtin, bêyî ku ji bo dadgehê bête guhastin. Tê zanîn, ku parêzer Enwer Fayiq Mislim ji nişteciyên navçeya Kobanî ye û kesayetiyeke civakî û naskirî di nav malbatên navçeyê de ye. Ew di sala 2007-ê namzetê navçeya gundên Helebê ji bo perlemana Sûriyê bû.